## Tirkiye û Azerbaycan hîn dev ji dagirkariya Ermenistanê bernadin!

»»» R:7



## Kê fermana êrîşa bo ser Îsraîl daye Hemasê?

»»» R:3

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (455) 10-09-2023Buha (1000) Tûmen*

## Terorîsma psîkolojîk

»»» R:4

## Rojavayê kurdistanê di navbera êrîşên Tirikiyê û bêtifaqiya kurdî de

»»» R:8

# Wekheviya qedera Jîna û Armîtayê

Carekî din keça Kurd a bi nave Armîta kevte ber xezeba dujminê mirovahiyê. Carekî din ev cinayet bi dijî keça Kurd li Tehranê qewmî.

Carekî din mirovkujên hov hêzên tepeserkare rejîmê bi hêceta Hicabê keça Kurd xistine ber lêdan û kutanê.

Carekî din heman rewşa kevtina Komayê, Heman weşartina rastiyan, heman sinaryoyên direvîn ji bona bê dengkirina dayîk û babe keça kurd.

Carekî din û carekî din û renge li pêşerojê de gelek carên dine.

Dubarebûna qedera Jîna Emînî bo Armîta Girawend heman sinaryo û heman pîlangêriya rejîma dijî Kurde komara îslamiye ku gelek bi zanebûn û bi awayê bijartî ev cinayeta bi dijî keçekî dine a Kurd encamp daye.

Renge ev pirsyare gelek kêm kevtibe ber raya me Kurdan ku erê gelo çima ev cinayetên girtin û lêdan û kuştina Jîna û Armîta yê, tenê bo keçên Kurd ev jî rast li Tehranê tête pêş? Yan rojane keçên Tehranî jî wekî Jîna û Arçîta yê têne girtin û lêdan û kuştin û nûçeyên wan nagihîjne me?



Yan keç û jinên tehranî li gorî biryar û dilê rejîmê hemî edetên hicabê berçav digrin û tenê keşên Kurdin ku diçne Tehranê û hicabê reayet nakin?

Bê guman bersiv gelek rohn û aşkeraye ku ev jî ewaye: Rejma dictator û dijî mirove wilayeta feqîhî,bi biryara rêberê xwe, 45 salan berya niha can û mal û namûsa netewa Kurd bi helal zaniye û niha jî peyrewên wî berdewamin li ser cî bi cî kirina vê fitwa û biryarê.

Lewra çi guman li vê hindê de nine dema ku hêzên rejîmê li tehranê û li metroyan û cihên giştî de bi ser xelkê de digerin ku heta hicaba destê zorê bi başî bi rê ve biçeî dema rastî keçekî kur dibin û dizanin ku Kurde û ne xelkê Tehranê ye, gelek hovane digrin û lêdidin û heçî cinayeteke bi dijî mirovê Kurd û keça Kurd bi misteheq û rewa dizanin û encamp didin, wek evê ku erkê şerîye xwe û biryara rêberê xwe û teklîfa rejîma xwe bi awayê herî baş encamp dabe.

Ev reftara hêzên rejîmê ku bi zanebûn bi dijî Kurdan û keş û jinên Kurd bi taybetî li Tehranê dubare dibe, bê guman armancên gelek qirêj li piştêne, hem bi wî awayî karîne Kurdekê bigrin û bikujin, hem dixwazin vê peyamê bidne hemî Kurdan ku Tehran cihê wan nine û nabe bo Kurdan ewle be, ku êdî ti Kurdek nekare yan nevêre biçe Tehranê.

Mînak renge gelek bin û tenê Jîna û Armîta nînin, li pêwajoya şoreşa Jin, Jiyan, Azadî de sala par, li Tehrana 20 milyon heşemetî de, ma ewa pirsyar nebû ku çima li nava xwenîşandanên Tehranê de çendîn keç û xortên Kurd dihatne kuştin? Ev qedera dê hêşta dubare bibe, u gelo Kurd jî dikarin bi kiryar û bertekekê vê peyamê bigehînine Tehranê ku ji bilî Kurdan ti kes û serdest û dagîrkerek jî li kurdistanê de ewlehî çinabe?

# Kê fermana êrîşa bo ser Îsraîl daye Hemasê?



N: Nûredîn Sofîzade





Xerc û têçoya şerekî malvêranker, û êrîşa bo ser Îsraîl ji aliyê girûpa Hemasê ve bi avêtina pitir ji 5 Hezar rokêt û mûşekan, bê guman ji kîs û paxel û li ser sifrika xelkê belalêdayî ye îranê û ji aliyê deshilatdarên rejîma terorîstperwere Komara Îslamî ve tête danê.

Ev 45 sale ku piraniya serweta Îranê ji aliyê vê rejîmê ve serfî tedexul li welatê dine û bo teyarkirin û pirçek kirinagirûp û milîsên girêdayî bi vê rejîmê tête kirin û heçî dema rejîma Îranê xwastibe û meslehet û berjevendiya vê hewce zanîbeî ev girûpane bikar anîne daku şer û kuştar û terror û teqîn û aloziyan li dewer û welatên dine de biafirînin.

Di demekê de ku bi hegera siyaseta şaş û qirêje rejîmê dorpêçên berfirehe abûrî ji aliyê gelek welatan û ji wan hin welatê Ewrûpî û Amerîka ve kevtine ser Îranê û bi vê hegerê ve xelkê welat birsî û bêkar bûye û nanê şewê çinînin û bi vê hegerê ve jî dehan diyarokê civakî bi ser xelkê Îranê de hatine, rejîm bi milyardan Dolar serfî teyar kirina girûpên terorîstiye girêdayî bi xwe li nawçê de dike.

Çend rojan berya niha bû ku li encama lihevkirina rejîma Îranê û Amerîka, li hember berdana çend giroganên sivîl yên Amerîkayî ku rejîma Îranê bi armanca xerac wergirtina ji Amerîka ev girtibûn, Amerîka 6 milyard Diravê biloke kirî yê Îranê azad kir, vê demê gelek rayedarên siyasî ev yêke anîne ziman ku rejîma Îranê wî diravî dem û dest xeric kiryarên terorîstî û alozkirina welatên nawçê bike. Ewa bû ku piştî salan heya qasekê aramiya di navbera Filistîniyan û Îsraîl de, rejîma Îranê girûpa Hemasê bi wî diravî teyar kir û xercê havêtina hezaran mûşrkan bo Îsraîl kêşa ustiyê xwe û bû sedemê rabûna peşqelê agirê şerekî malvêranker ku dirav ji kîsî xelkê Îranê diçe û malvêranî û xwîn jî bo Filistîniyan û Îsraîliyan re dimîne.

Hemî cîhan baş dizane ku agir xweşkerê şer û êrîşê rejîma Îranê û rêberên wê ne. Hevdem di gel xwîn û agir û barût û kavilkariya bi hegera êrîşa Hemasê bo ser Îsraîl û bertek û bersiva Îsraîl û êrîşa esmanî û bombebarana Xeze û bajarên Felistîniyan, li Tehran û hin bajarên dine yên Îranê, rejîmê ji kirêgirtî û hêzên xwe xwast ku derkevin û vê êrîşa Hemasê wek serkevtinekî mezin pîroz bikin û bikne cêjn, ewa jî di demekê de bû ku hemî cînan bi çavê nîgeranî û bi xemgînî ve mêzeyî wî şerî dikin, ew kiryara Komara Îslamî gelek bi zelalî dide xuyakirin ku ferman û biryar û alavên şer û mûşek ji kîderê re hatine danê û dabînkirin.

Xelkê Filistînê dibe baş bizanin ku rejîma terorîstperwere Îranê xêr û xweşiya wan naxwaze, belkû ev box we kirine amûrê şer û tevdaniyê û tenê bi dû berjewendî û îdolojîka xwe de ye.

Di demekê de ku hin welatên erebî ji Îsraîl nêzîk bibûn û peywendiya xwe asayî dikirin û di hefteya derbasbûyî de Erebistanê jî pêngav bo asayîkirina peywendiya xwe tewî Îsraîl havêt, ev pêşbîniya dihate kirin ku rejîma Îranê ku ji tires vê nêzîkbûnê agir girtiye û egera tevdanî û bikaranîna girûpên girêdayî bi xwe bo têkdana vê rewşa aram têk bide û şer û aloziyê biafirîne.

Çimku ev 45 sale rejîma Îranê direvde kevrê berewanî ji Filistînê sîngê xwe dide, lê di rastî de tenê box we kiriye dukan û bazarê pê dike.

Heçî gava aştiyek di navbera Îsraîl û Filistînê de hatibe pêş yan jev nêzîk bibin, Komara Îslamî girûpên girêdayî bi xwe hay dane bo çêkirina şerekê û hemî rîsê wan jê kiriye hirî.

Di dawiyê de em xatircemin ku ev kiryarên rejîma Îranê ji aliyê Îsraîl ve bê bertek namî û mixabin dê dûkela vê siyaseta qirêje deshilatdarên rejîmê biçe nav çavê xelkê welatê meî her çawan ku niha xelkê Filistîn û Sûriye û Lubnan û….. baca wan şerxwaziya rejîma Îranê û girûpên girêdayî bi vê didin.

# Ger dê hebûya me padişahek



**N: Serbest Urmiye**




Renge ev beyte li helbesta seydayê Ehmedê Xanî, li gor şiroveya îro bo cîhana pêşkewtî ya mirovahiyê li cem hin şirovekaran were lome kirin, ji ber ku di ramanên wan de sîstema cîhanî ya îro mirovtever û demokrat e.

lê peyv û pêgeha padişah weke xwedî desthilata reha ku xwedî serweriyê li ser hemû aliyên jiyana xelkê ye, hatiye pênasekirin û hevdijiya sîstema nû dike. Lê di vê derheqê de mirov dikare bêje ku piraniya dewletên ku niha di şekil û sistemên nû yên îroyî de hikm li ser Kurdan dikin, berhema hebûna padişahekê ne ku Xanî di wî heyamî de ji ber tunebûnê di nava Kurdan de dinale. Kul û kesera mezintir ji nebûna xwedî kulaheke layîq ku di wî heyamî de pitir Xanî'yê mezin pê dinale, netifaqî û nebûna yekîtiyekê ye ku heya îro jî pêsîra gelê Kurd bernedaye û sedema peyda nebûna dewleteke Kurdî û zalbûna dagîrkeran e bi ser xak û jiyana me de. Lewre Xaniyî'ê mezin rast gotiye ku:

Ger dê hebûya me padişahek
Layîq bidiya xwedî kulahek
Xalib nedibû li ser me ev rûm
Nedibûne xirabeyê di dest bûm

Heke em li dûrî û dirêjahiya dîroka xwe ya bindestî û bê dewletiyê vegerin û bala xwe bidin ya ku îro û di dîroka hevçerx de tê serê me, erzan bûn û bê biha bûna xwîna me ye, nemaze li ser xaka me. Erzanbûna xwîna me di sala bihorî heta meha îsal ya pêşiya me de bi belge hatiyê selimandin Hêj bêhna xwîna keça nûgihîştî ya Kurd wate Jîna Emînî û bi sedan keç û xortên Kurd ku di li dijî zulm û zoriya rejîma Îsamî ya Îranê de serhildan,ji welat ranebûye ku dîsan Tehran yê diçe ku bi xwîna keçeka din a nûgihîştî ya Kurd, Armîta Giravend têhnîtiya dagiîrker bişikîne.

Di 9'ê meha Rezberê ya îsal de ku sal û wextek bi ser serhidana "Jîna"yê de derbas dibe û di pêxema jiyaneke azad de him bo jinê û him jî bo civakê, lehiya xwînê li Kurdistan û Belûçistanê rabû, dîsan bi heman terzê kuştina Jîna'yê, Armîta Girawend dikeve ber êrîşa bi nav parêzvanên "Hicab"ê û şerê mirin û jiyanê dike. Lê çima dîsan keça Kurd û çima dîsan li Tehranê?

Her çend ku serdemê niha serdemê tund û tûjina neteweyî nine ku tola xwînê bi xwînê vebe, lê gelek caran gotina birêz Arif Qurbanî, nivîskar û rewşenbîrê neteweyî yê başûrê Kurdistanê, bala mirovan radikişîne ser vê çendê ku divêt bihayê xwîna gelê xwe binirxîne. Birêz Qurbanî di hevpeyivîneke de tevî kanal a TV'yê ya "Kurdistan24"ê û di rêkevta 12,10,2019'an a Zayînî de û li hember komkujiya gelê Kurd bi destê dagîrker de dibêjê ku divêt em ji pîrozî û biha ya xwîna xwe, weke çeka serkevtinê mifahê wergirin. Wate nabe ku em rê bidin ku xwîna gelê me wiha bê biha û bê heyf bi destê xelkê were rejandin.

Mirov dikare ku ji van beytên helbesta Ehmedê Xanî ku dibêje:

Ger dê hebûya me ittifaqek
vêk ra bikira me inqiyadek
rûm û ereb û ecem temamî
hemiyan ji me ra dikir xulamî

û gotina Arif Qurbanî, ramaneke nû biafirînê ku têde mirovê Kurd li hember jiyan û mirina xwe de ji tak û civaka Kurdî xwedî derkeve. Ji bo ku em bigihîjin encamê jî, rêya me tenê yekîtî û yekbûna me ye da ku gotara Kurdî û Kurdjiyanê bihêz bike ku ev jî hewceyî rêberiyeke yekdeng di astê neteweyî de ye. Heke me biha bidaya xwîna xwe û gelek caran bersiva xwînrejan weke wan bidaya, bê guman em bi dehan û sedan serhildanê weke serhildana "Jîna"yê di pêxema jiyanê de derbas nedibûn ku xaka me heya niha jî bêhna xwîna me bide. Êdî ne dagîrker û ne rejîma Îslamî ya Îranê dikarîn bê heyf li hember kuştina me derbas bin. Vê demê mirov dikarî mizgîniyê bide Şêrko Bêkes ku êdî Tehran nevêre û nikare bi mirina me bikene.

# Terorîsma psîkolojîk



**N: Dr.Mecîd Heqî**

Felsefeya Komara Îslamî ji bo berdewamiya desthilatdariya xwe ev e: ”Al-Nasro minal xawf” - Serkeftin ji tirsê ye. Eva bingehê piraniya kiryarên tundûtûjiyê yên rejîma Tehranê li dijî rexnegir, opozisyonê, çalakvan û mafparêzan di erdnîgariya siyasî ya Îranê de ye. Piştî destpêkirina Şoreşa Jin, Jiyan, Azadiyê rejîm ji bo kontrolkirina qeyranên li pey hev li welat terora derûnî zêde kir.

Di mehên derbasbûyî de, beriya salvegera kuştina Jîna yê ji aliyê rejîma Îranê ve û destpêkirina şoreşa Jîna yê, rejîma Îranê dest kiriye bi hin gefên cur bicur. Di nav wan de ji ser kar derkirina mamosteyan li zanîngehan û destnîşankirina “meddahan” (pesnbêjan) wek mamostayên zanîngehan, dûrxistina xwendekaran û hesabpirsîna xwendekaran, zexta li ser malbatên şehîdên şoreşa Jîna yê û rêgirtina li bîranîna wan. Zexta herî giran a rejîma Îranê li dijî Kurdistanê, bi zexta li ser dewleta Iraqê û Herêma Kurdistanê ji bo cîbicîkirina peymana bi navê Ewlekariya Sînor û çûna hêzên çekdar bo sînorên Rojhilat û Başûrê Kurdistanê şandine. Armanca sereke ya terorîzma psîkolojîk di Komara Îslamî ya Îranê de tirsandina xelkê ye. Komara Îslamî ya Îranê bi bikaranîna medyayên girseyî û amûrên ragihandina giştî, bi awayên curbicur ast û çarçoveya terorîzma dewleta xwe kûr û berfireh kiriye. Tehdîdkirin û dirustkirina atmosfera tirsandinê, bûye alîkar ku rejîma Îranê di gelek waran de bijî û xelkê ji têkoşîna bidestxistina mafên xwe dûr bixe. Rejîma Îranê bi rêya terorîzma psîkolojîk dixwaze bi tirsandinê xelkê neçar bike ku xizmeta xwe bike û bi awayekî bê rehm atmosfera tirs û bêbaweriyê li ser xelkê ferz dike. Siyasetek ku dibe sedem mirov xwe ne ewle û bêçare hîs bikin.


Terorîzma derûnî zincîreyek ji kiryaran e ku balê dikişîne ser rewşa derûnî û hestiyar a civakê ji bo ku di nav endamên civakê de bibe sedema tirs û xofê û mirov xwe ewle seh neke û ne karibe jiyana normale xwe kontrol bike ji ber bêîstîqrarî û tirsê Xwe winda bike û bitirse li ser pirsgirêkên civakî xwedî helwest bin. Di terorîzma psîkolojîk de atmosfera ku di civakê de serdest e, atmosfera tirs, bêbextî û bêhêvîbûnê ye. Armanca terorîzma psîkolojîk ew e ku bi tirsên hestyarî yên derûnî û giştî, tirsê çêbike, dest bixe nava beşên tarî yên hişê mirov, bibe sedema guman, bêbawerî, xwebawerî û paranoya li ser kesên din, xwe û cîhanê.

Yek ji taybetiyên terorîzma derûnî ew e ku li ser kom û çîneke taybet a civakê bisekine, da ku kesên di wî warî de kar dikin, wisa nerihet û ditirsin ku ji tirsa derkirin û “bîrîna nanê xwe newêrin pirsgirêkên civakî çareser bikin”. Mînaka van kiryaran jî derxistina komî ya mamostayên zanîngehê û anîna “meddah” an di şûna wan, an jî bêparkirina gelek xwendekarên zanîngehê ji mafê xwendinê ye. Di hiyerarşiya hewcedariyên Maslow de, yek hewcedarî hewcedariya hestiyar û ewlehiyê ye. Dema ku ev ji mirov tê girtin, hewcedariyên din, di nav de hewcedariyên laşî, hêdî hêdî têne tawîz kirin.

Bandora terorîzma derûnî ya li ser mirov li naw jîngehêde

Li gorî Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê - WHO (2008), beşdarbûna di civaka sivîl û pêvajoya siyasî de ji bo tenduristî û refaha kesan girîng e. Beşdarbûna di xebata civakê de hesta berpirsyariya mirov ji bo refaha take kes û civakê zêde dike. Terorîzma derûnî ya rejîma Îranê bi rêya tundûtûjiya siyasî, şiyana takekesan ji bo beşdarbûna di jiyana civakî û siyasî de têk dide û baweriya wan bi jiyana civakî û siyasî ji dest dide. Encam îzolekirin û dûrxistina kesan ji civakê û bêbaweriya bi xebata siyasî û beşdariya siyasî ye. Tiştê ku Komara Îslamî heta îro bi awayên curbicur kiriye, kêmkirina beşdariya civakê di mijarên siyasî de û tenê bi riya kirêkirina kesên girêdayî û dilsozên rejîmê ye – çi ev dilsozî ji ber îdeolojî û çi ji ber berjewendiya darayî be. Lêbelê, terorîzma psîkolojîk dibe sedem ku kes hêviya xwe ji her guhertinek li welat winda bikin.

Bêbawerî û vekişîn encama şîddeta siyasî û terora psîkolojîk e. Terorîzma psîkolojîk rê nade ku kes bi awayekî komî û eşkere derbarê mijarên giştî yên bi civaka xwe re têkildar bin.




Bi sedema tundûtûjiya siyasî û terorîzma derûnî ya rejîmê, heta aliyên navxweyî yên rejîmê wek “reformxwazan” ku piştgirên sereke ne û yek ji sedemên mayîna Komara Îslamî ne, ji çalakiyên siyasî paşde çûne. Lêkolîna Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) îsbat dike ku terorîzma psîkolojîk û şîdeta siyasî dikare şiyanên kesan xera bike û bêbaweriya lêgerîna arîkariya civakî li derdora xwe winda bike.

Terorîzma derûnî ya rejîmê dibe sedem ku baweriya mirovan bi pêkhateya exlaqî ya civakê û hemû cure saziyên dewletê ji dest neçe û hemû sîstemên îdarî wek dijberên xwe bihesibîne û heta baweriya xwe bi pirosesên îdarî neyne. Terorîzma psîkolojîk dilxwaziya kesan a ji bo beşdarbûna çalakiyên siyasî, di nav de rêxistina civakê, kêm dike. Bi armanca dûrxistina kesan ji beşdariya siyasî, rejîm çalakvan û girtiyên siyasî işkence dike û hewl dide bi rêya “îtirafkirinên bi zorê” li ser televizyonê, kesan neçar bike ku xwe radestî rejîmê bikin. Di gelek lêpirsîn û hişyariyan de, rejîm pêşniyara derketina ji welat dike û kesan teşwîq dike ku li welatên rojava bigerin. Ev êşkenceya girseyî ya li ser endamên civakê trawma û nexweşiyên kronîk di mirov de dihêle ku dibe sedem ku kes bi salan ji mirovahiya xwe bêpar hîs bikin.

Bandora terora psîkolojîk li ser karûbarê civakê¨

Civak bi awayê giştî û gelemperî wekî tevnek têkiliyan, ku li cîhek fizîkî hatî berhev kirin, ku xwedî bawerî, rewş, fikar, perspektîf û têkiliyên hevpar in, tê pênase kirin. Hêz û şiyana danûstendinê ji bo tenduristiya ferdên civakê girîng e, nemaze dema ku ew di bin trawmayek kûr de bin. Lêkolîn diyar dike ku ji ber şiyanên kolektîf ên civakan, ku hevgirtina hevgirtina civakî û şiyanên ferdên civakê ne, şiyana kolektîf wekî “yekîneyek” yekbûyî dibe sedema guhertin û bandorê li ser xêra giştî û endamên civakê. Li aliyê din terorîzma psîkolojîk ne tenê şiyana takekesan a di civakê de kêm dike, di heman demê de bingehên civakê lawaz dike. Terora psîkolojîk dibe sedema hilweşandina saziyên civakî, qelskirina dîrok, bawerî û nirxên civakê û gelek caran dibe sedema tevliheviya civakî. Lêkolîna WHO îsbat dike ku zirara civakê wekî qada fizîkî ya hevpar a mirovan dibe sedema xerabûn û qelskirina çand û nasnameya hevpar. Terorîzma psîkolojîk kapasîteya civakê xera dike, tirs û fikarên kolektîf xurt dike û xebatên kolektîf ên civakan têk dide.

Ji roja ragihandina fermana cîhadê ya Xumeynî di 19ê Tîrmeha 1979an de, rejîma Îranê nîşan daye ku bi kuştinên komî, teror û bombebarankirina gundên kurdan, baregehên partiyên Rojhilatê Kurdistanê û heta kampên penaberan li başûr, armanca wê tunekirina tevahiya civaka kurd e. Nêrîna rejîmê ew e ku Kurdên baş Kurdên mirî ne. Şoreşa Jîna yê nîşan da ku rejîma Îranê ne tenê şexsan ji xwe re dijmin dibîne, dijminatiya tevahiya civaka Kurd dike. Lêkolînên tundûtûjiya siyasî li welatên din ên wekî Îrlanda, Bosna, Srî Lanka, Pêro, El Salvador û Zimbabwe îsbat dikin ku tundiya siyasî encamên mayînde li

Dom R:5

Doma R:4

ser civakê heye, nemaze lawazkirina perwerdehiya giştî û rêgirtina civakê ji perwerdekirina rêberên paşerojê. . Mirov li jîngehên fizîkî bi hêsankirina berhevdana aramî, ewlehî û nasnameya kolektîf, dîrok û serbilindiyê, civakan mezin dibe. Ev dînamîkên têkiliya di navbera kes û hawîrdorê de pêk tînin. Hilweşandina jîngeha fizîkî, tundiya siyasî û terorîzma psîkolojîk hesta yekitiya endamên civakê ji holê radike. Hilweşandina jîngeha fizîkî rasterast bi tunekirina çanda mirovan ve girêdayî ye. Komara Îslamî ya Îranê ji destpêka desthilatdariya xwe ve, bi talankirina kanên jêrzemînî, çêkirina bendavên dûr ji pîvanên jîngehparêzî û zanistî û talankirina çavkaniyên avê, hewla têkdana jêrxana jîngehparêziya Kurdistanê daye. Herî dawî zuwakirina bi pratîkî ya gola Urmiyê ye. Heya niha ti lêkolînek li ser bandora zuhabûna gola Urmiyê li ser jiyana mirovan û têkiliyên bi jîngehê re nehatiye dîtin, lê berçavgirtina bandorên wêrankirina jîngehê li Ruanda, welatên Baltik û Kosovayê nîşan dide ku zuha kirina gola Urmiyê çi wêraniyekê pêy xwe ji bo civakê û jîngehê bi cîh pêle. Li gor amarên fermîye deselatdariya Îranê rêjeya bêkariyê li Kurdistanê %15 e, lê rêjeya bêkariyê li Îranê bi giştî %9 û li parêzgehên farisî jî tenê %7 e. Li gorî amarên fermî, li parêzgehên Îlam, Kirmaşan, Loristan, Sana û Urmiyê, salane ji her 100 hezar kesî 9 kes bi xwekuştinê dimirin û li parêzgehên Farisî yên weke Tehranê jî rêjeya giştî pênc ji sedî ye.

Kontrolkirina jîngeha fizîkî şêweyeke din a terorîzma derûnî ye ji aliyê rejîma Îslamî ve. Rejîma Îslamî ya Îranê di yekemîn salvegera şehîdkirina Jîna Emînî de, jibilî milîtarîzekirina Seqiz û bajarên din ên Kurdistanê, derdora gora jînê bi tankan dagîr kir. Ev yek ne tenê nîşana siyaseta kolonyalîst a rejîma Îranê ye li ser Kurdistanê, belkî nîşana ragehandina destdirêjiya wê li dijî gelê Kurd e. Terorîzma derûnî ya rejîmê bi hilanîna hesta tirsê ya komî, atmosfera giştî û kiryarên civakê diguherîne. Lêkolînên tundûtûjiyê yên li Nîkaragua, Kolombiya, Guatemala, Burma û El Salvador nîşan didin ku şîdeta siyasî û terorîzma psîkolojîk bandorek li ser şiyan û potansiyela civakê dike ku bigihîje aşitiyê û rûbirûbûna tundiya siyasî. Tirsa girseyî û îzolebûna girseyî dibe sedema dijberî û tundûtûjiyê di nav civakê de, armancek ku Komara Îslamî dixwaze bi rêya terorîzma derûnî bigihêje wê. Rejîma Îranê terorîzma derûnî bi awayekî bernamekirî ji bo kontrolkirina civakê û weke rêbazeke tundiya siyasî bikar tîne.

Kontrolkirina cihên giştî û têkbirina hesta aramiya giştî di civakê de bi rêya kontrolkirina bazar, dukanan û nehiştina xelkê ji “xirabiya hicaba” û “cil û berg”ê, şêweyekî din ji terorîzma derûnî ya rejîma Îranê ye. Encama vê cureyê şîdetê, têkbirina têkiliyên civakî û pêşxistina “nirxên dijber” di nava civakê de ye. Ev diyarde di amarên Îranê de bi zelalî tê dîtin. Li gor amarên rojnameyê, temenê fuhûşê li Îranê giheştiye 14 saliyê û temenê vexwarina eraqê li wî welatî giheştiye 15 salan.

Di encamê de terorîzma derûnî ya Komara Îslamî dibe sedema jinavbirina civaka sivîl û kêmkirina hejmara rêxistinên herêmî di civakê de. Endamên civakê hesta berpirsyariya xwe ya li hemberî civakê winda dikin û di gelek waran de rêxistinên dewletê yên ku fonksiyona wan a siyasî nîne û tenê ji bo xizmetê hatine avakirin, berdidin. Ji bo vê mebestê jî rejîma Îranê bi dûrxistina mamostayan û bi darê zorê xanenişînkirina mamostayan, zexta li ser zanîngehên Kurdistanê û dûrxistina mamosta û xwendekarên çalak weke serkirdeyên potansiyel ên civakê, hewla dûrxistina kes û civakê dide.

Karê saziyên dewletê di xizmeta terora derûnî ya rejîmê de

Di civakeke demokratîk de, azadiya bingehîn, piloralîzm, berpirsiyarî û bawerî bi hev re dibe sedema pêşketina takekesî û refaha civakî, tundiya siyasî û terorîzma psîkolojîk krîza giştî û civakî çêdike. Di civakek normal de, kes xwe dispêrin strukturên hukûmetê da ku derfet û beşdariyek watedar peyda bikin da ku tenduristiya bingehîn, hewcedariyên refahê yên wekî pergalên bersivdana acîl, av, paqijî, tenduristî û perwerdehiyê peyda bikin. Terorîzma derûnî ya rejîma Îranê rasterast bi ast û kalîteya xizmetên dewletê ve girêdayî ye. Terorîzma derûnî ya rejîmê ne tenê zirarê dide kes û civakê, belkî dibe sedema 1. Têkbirina sîstemên îdarî yên ji bo jiyana rojane pêwîst in. 2. Lewaziya sektora giştî; Wendakirina hesta berpirsiyariya ji bo milkê giştî ji aliyê kesan. Li gorî Navenda Cîhanî ya Bextewariyê (Global Happiness Center) , ji sala 2018 heta 2023, Îranî dê di nav sê welatên herî hêrs ên cîhanê de cih bigirin. Ev jî berhema terorîzma derûnî û tundiya siyasî ya Komara Îslamî ya Îranê li dijî xelkê Îranê ye.

Tundûtûjiya siyasî, civakî û aborî li dijî netewa Kurd, şantaj û bombebarankirina kampên penaberên Rojhilatî li Başûrê Kurdistanê, bombebarankirina baregehên partiyan û terorîzma mûşekî nîşana wê yekê ye ku Komara Îslamî ne tenê jinavbirina takekesan e, belku kolektîfê hemû gelê Kurdistanê ye. . Bo vê mebestê jî bi rêya terorîzma derûnî, hewl dide asoyên gelê Kurd ji bo paşerojê bi terorîzmê kor bike û çalakvan û serkirdeyên qada civakê ji nav bibe û şiyana civakê ya wesifkirin yan plansazkirina paşerojê bixe metirsiyê. Rejîmeke ku ciwanekî ji ber “nexwestina hicabê” bikuje jî dikare qirkirinê bike. Bombebarankirina dibistan û kreşan ji nêz ve bi jenosîdê ve girêdayî ye. Wêrankirina fizîkî ya jîngeha Kurdistanê rasterast bi têkbirina çand û nasnameya neteweyan ve girêdayî ye.

## Navenda Teşkîlat: Em daxwazê ji rêkxistinên cîhanî dikin li derheq qedera Armîtayê ve givaşên zêdetir bêxne ser rejîma komara îslamî

Kom û komikên mirovdost, berevankarên mafê mirov!

Civatgeha medeniye Îran û Kurdistanê!

Herwekî hemî aliyek agehdarin roja yêkşembiya derbasbpyî, 9 ê rezberê Armîta Giravend keça Kurd xelka Kirmaşanê û akinciyê Tehranê digel hevalên xwe li dema çona bo qutabxanê li mêtroya Tehranê ji aliyê hêzên komara îslamiya Îranê ve bi hêceta evê ku hicaba destê zorê çinebûye, kevte ber lêdan û kutanê û piştî evê ku bêhiş kevt, bo nexweşxana Fecir ku nexweşxana hêzên çekdare rejîmê ye hate veguhastin.

Piştî vê bûyerê hêzên ewlehî yên rejîmê bilez û ji bona pêşîgirtin ji nerizayetiya xelkê demûdest rêkarên tuned ewlehî girtine bera xwe û heya niha jî îzn nedane t ukes Armîta yê bibîne, Heta rojnamevanê yêk ji rojnamên tehranê ku ji bona amadekirina raporekê li ser vê bûyerê sardana nexweşxana Fecir kiribû,ji aliyê hêzên rejîmê ve hate destbiser kirin ku piştî belavbûna nûça li vê derheqê de hate serbest kirin. Herwisa hêzên rejîmê bo çend demjimêran hevpoliyên Armîta yê binçav kirin û gef ji wan kirin ku nabe li ser vê bûyerê çi qiseyekê bikin. Ji vê jî girîngtir Şehîn Ehmedî dayîka armîta yê ku bona dîtin û haydarbûna rewşa keça xwe sardana nexweşxanê kiribû, ji aliyê hêzên rejîmê ve îzn pç nehate danê û gelek cihê heyrîmanê û li rewşekî nexweş de û ev bûyera ku bi serê keça vê de anîneî, bêşermane ev jî girtin û heya nihajî her di bin zêrevaniyê de ye.



Ewa ku li derheq rewşa Armîta giravend de bûye cihê nîgeraniya xelkê Îran û kurdistanê, ducarîbûna bûyera canjidestdana Jîna Emîniye ku heta niha jîrejîm amade nebûye rastiyên vê bûyerê bikêşe ustiyê xwe. Lewma em daxwazê ji kom û komikên mirovdost û navendên berevankar yên mafê mirov û xebatkarên civatgeha medenî li îran û Kurdistanê dikin ku givaşê bêxne ser organêt peywendîdar yên rejîma komara îslamî ku rastiya çawaniya qewimîna vê bûyerê bo xelkê û raya gişî re aşkera bikin û çiyê din bi hêceta hicaba destê zorê Jin û Keçên welatê me tûşî bûyerên hankî û bêrêzî û bêhurmetiyê nekin.

Navenda Teşkîlata Hizba democrat a Kurdistana Îranê
14ê meha Rezbera 1402 Rojî

# Totalîtarîzma îslamî a Îranê- dijayetî tevî merivahiyê



N: Elî Munezemî




Alav û amûrên rejîmên totalîtar bi giştî û yên komara Îslamî a Îranê bi xasmanî di hember her dijbereke navxweyî an derekî, teror e. Rejîma Îslamî a Îranê derheq wê yekê, serî li hemû sîstemên totalîtar li dirêjahîya dîrokê de, standîye û li wê meydanê de pêşengê wan e. Ev gotina han ji xwe ve nayê gotin û li ser bingeha sedem û delîlên objektîf dikarin werin îspat kirin:

1. Her sîstemek totatîter û xwedîyê îdeolojiyeke resmî ye û çaverêyê hindê ye ku her kes wê bipejirîne.
2. Partiyek yan komeke elît ya yekane, bi hiyerarşîk avakirî ku serdest e yan jî bi burokrasiya dewletê re têkildar e.
3. Xwediyê sîstemeke terorê û sîxurîyê bo kontrolê li rêka polîsê nepenî ve ye.

4. Kontrolek bi temamî li ser medîya û ragihandinên giştî de hene.
5. Kontrolek bi temamî li ser çek û hêzên çekdar de hene.

6. Birêveberîyek navendî yan kontrol li ser hemû aborîyê de hene.

Totalîtarîzma Sîstema Komara Îslamî a Îranê li herdu cinayetên derheq Jîna Emînî û Armîta Geravend de kirinî, bi rohnî xwe nîşan didin û ne hewceyê tiştek din e. Ji ber ku:

1. Li ber îdeolojîya îslamî a xumeynîstî, rejîmê çavnihêrî heye ku hemû keç û jin, hicaba xwe miqeyet bin û eger tayek ji pora serê keçekê yan jinekê bê xûya kirin, yê textê Yezdan û Xwedêyê Îslama Xumeynî biheje û yê qiyamet rabe.

2. Ew rejîma ji aliyê komek elîtên neteweya serdest û melayên Welayeta feqîhî ve birêve diçe û wisa dest danîne ser sîstema birêveberiya hikûmetê ku li serî heya binî, merivên di sîstema welayetê feqîh de helîyayî cih girtine. Li ber hindê jî gava mohreyek rejîmê tûşî encamdana cinayetekê dibe, li serî heya xwarê li hember de erkdar dizanin ku nehêlin çi alîyeke wê cinayetê were xûya kirin û hemû alîyek cehd dikin bo veşartina wê.

3. Rejîm xwediyê sîstemeke raçandî a teror û çavdêrîyê ye ku karbidestên wê li encama çi cinayetekê hember dijber yan ewên ku goreyî nirx û pirensîpên rejîmê tev nagerin, xwe naparêzin. Xêncî wê sîstema sîxurî-cinayetkarî, ew karmend û hemû mohreyên xwe jî li qirax wan de, perwerde dikin ku ew jî wek guh û cîbecîkarên sîyaset û bernameyên rejîmê xwe berpirsiyar bizanin û hazirîya wan bo encamdana her cinayetekê hebe. Rêjîm navê wan jî bi «Fermankerê qencî û nehiştina ji neqenciyê» nav lê kiriye. Ewa ku hindik kes li kolanan, parkan an rawestgehên metroyên nav bajaran de hêriş dikin ser keç û jinan û li wan dixin, bêhurmetîyê bi wan dikin, digrin yan heta bi lêdanê wan dikujin û gelek cinayetên din, li wê yekê ve serî hildide ku rejîma Îranê hemû pêkhateya xwe bo terorîzmê perwerde kiriye û her karmend yan birêveberek wê xêncî erk û vezîfeyên xwe yên fermî, erka xwe dizane ku li her cihekê bi xwe hecve bizane, wek kesek terorîst jî derkeve hember xelkê yan neyarên hikûmetê.

4. Rejîma Îslamî a Xumeynîstî her li destpêka desthilatdariya xwe ve cehd kir ku dest dane ser ragihandinên giştî û dijî wan kesan e ku cehd dikin berevajî çavnihêrîya rejîmê, nûçe û rastîyên derheq civakê parve bikin. Çi li serdem şehîdbûna Jîna Emînî de û çi jî di wan çend rojên derbazbûyî de ku ev qeza anîne serê Armîta Geravend û ev cinayet afirandin, rojnamevanên ku derheq wan cinayetan tişt bilav kirin yan dixwastin zaniyariyan dest bixin, ketin ber xezeba rejîmê. Ev qet naxwazin ku rastiyek xêncî ewa ku ev bi rast dizanin, were bilav kirin û ber hindê jî ev sîstema totalîtar dixwaze bi hemû awayekê dest dane ser emrazên ragihandinê.

5. Rejîma terorîstî li rêya Spaha Pasdaran û hêzên xwe yên dinêye çekdar ve, dest li ser hemû çekan de girtiye û hêzên çekdar li rêya merema xwe de bikar dîne û dixwaze bi rêya wan ve jî hem neyarên xwe li derve û hem jî hundir de bitirsîne û stûnên desthilatdarîya xwe qahîmtir bike. Li dema serhildan û şoreşa Jîna yê de, her ewan hêzên çekdar li dijî xelkê cinayet afirandin û bi sedan kes kuştin yan girtin û di girtîgehan de şikence û destdirêjî kirin ser wan.
6.Sîstema aborî jî di bin destê rejîmê û bi xasmanî berpirsyarên hêzên çekddarî-terorîstî ên Spaha Pasdaran û binke û saziyên ser bi rêberê rejîmê de ne. Dema ku ev dixwazin xelkê bêdeng bikin, ewê sîstema aborî jî wek parek li sîstema xwe ya cinayetkare totalîtarîstî bikar tînin û bi birsî kirina xelkê cehd dikin ku wan bişkênin û bêdeng bikin.

Lê xêncî ew tiştên ku li serve de me bas lê kir, Sîstema totalîtara Îslamî a Îranê li ber hizr û zêhnîyeta xwe, rejîmek totalîtar e bi wî rengî dijberîya merivahiyê dike.

Birêveberê wê rejîmê jêvene ku ewan nusxe û reçeteyek dîtine ku bi wê yê civak bigihîje gupika kemalê û yê civakek herî îdeal pêk were. Li ber hindê jî dijayetîya hemû şêwe û hizr û ramanên din dikin. Ev qet li xwe napirsin ku eger sîstemek bi derketina hindik pora serê jinekê îdealên xwe winda bike û biherife, gelo ev civak çend dikare xwe li hember xeterên mezintir rabigre!? Eger karbidestên rejîmê di heyamê nêzîk 45 salan li desthilatdariya xwe de hêşta nekarîbin îdealên xwe li civaka bin destê xwe de cêgîr bikin, dê çawa bikarin bi rêya hinartina şoreşê wan îdealan di ser civakên din de bisepînin!? Helbet şandina şoreşê bo civakên dîn, kar û erkê sîstemên totalîtar e. Nekû eger sîstem totalîtar û dijî merivahiyê neba, ma kî dikare hinde hizrên şaş hebin!?

Ev xwe bi tinê xwediyê rastîyê dizanin û xêncî rastîya xwe, çi rastîyek din qebûl nakin û napejirînin. Bo wan rastî her ev e ku rêberên wan bas dikin. Lê naxwazin qebûl bikin ku rastî bi goreyî demê û rastîyên serdem tên guhertin. Rastîya îro, nikare bo sibê jî rast be. Li ber ku civak tê guhertin û nifş tên guhertin. Jîna û Armîta li ber ku rastîya ku wan baverî pê hebû û ewa rejîmê baverî pê heye, li hev cuda ne, ketin ber xezeba mîrê wan yê xezebê û celadên merivan. Ev yek tinê li sîstemekeke totalîtar de dikare pêk were.

Em dikarin bi dehan sedem û bersivên din jî rêz bikin. Lê her hinde bese bo nîşandana rûyê wê rejîma dije însanî a Xumeynîstî. Yê merivahî li ser nemerivahiyê de serkeve û ev roj jî ne dûr e.

## Nerîna Lîderan




**“Joe Biden”:**

“Amerîka pişta Îsraîlê digire û piştgiriyê dide mafê Îsraîlê ku xwe biparêze”




**“Ursula von der Leyen”:**

“Ez êrîşa terorîzmê ya li ser Îsraîlê şermezar dikim û Îsraîlê mafê berevanîkirin li xwe heye”.



**“Volodymyr Zelensky” :**

“Ez bawer im dê terorîst bi ser nekevin û nabe cihê terorîstan di cîhanê de hebe”.



**“Annalena Baerbock”**
**“**Îsraîl li gorî yasaya navneteweyî piştgiriya tevaw a me heye û dikare li hember terorîzmê berevaniyê li xwe bike”.

# Tirkiye û Azerbaycan hîn dev ji dagirkariya Ermenistanê bernadin!



**N:Eskender Ceiferî**



Ev çend sal in ku Azerbaycanê bi piştevaniya Tirkiyê dest daniye ser beşeke zêde ji axa Ermenistanê.

Niha jî, ji destpêka 2023’an ve ji bilî Artsaxê, ew dixwazin dest danîn ser hin navçeyên din jî.

Artsax, Nagorno Qerebax an Qerebaxa Jorîn an jî Komara Qerebaxa Çiyayî, ku wek Artsax jî dihat naskirin, dewletek bû ku di asta navnetewî de bi fermî nedihat naskirin. Li gor saziya Neteweyên Yekbûyî, ewder, perçeyek ji axa Azerbaycanê ye. Lê di rastî de ewder wek dewleta DEFACTO ji Azerbaycanê veqetiya bû.

Ew, heman dewlet bû ku Azerî û Tirkan têk bir.

Komara Nagorno Qerebaxê yan jî Artsax li başûrê rojavaya Azerbaycanê ye. Ew li rojhelat bi Azerbaycanê re û li rojava jî bi Ermenistanê re hevsînor e.

Ji damezrîna serxwebûna di 1991’an vir ve, zimanê fermî yê Qerabaxê, Ermenî bû. Lê piştî ku Azerbaycanê dest danî ser vê navçeyê, Azerî kire zimanê fermî.

Tevî ku heşîmeta herî zêde ya vê navçeyê Ermenî ye û hinek Kurd jî li wir dijîn, lê di rastî de ne kesek pişta Kurdan digire ku ew li wir bibin xwedî maf û ne jî kesek bi eşkere pişta Ermeniyan digire. Saziya Neteweyên Yekbûyî ku weke saziya ji bo parastina mafên neteweyan tê binavkirin, ji bo parastina mafê Ermeniyan li wir tev nagere.

Rast e li wir şerê Kurdan nayê kirin lê belê şerê Ermeniyan û hemû wan pêkhateyan tê kirin ku li dijî serdestiya Azerbaycanê li wir tev digerin.

Mijar kûr dibe û di rojên derbasbûyî de Tirkiyê bi awayekî eşkere ragihand ku ewê li hemberî Ermenistanê di eniya Azerbaycanê de bin heya tevahiya navçeyan ji destê Ermenistanê yan jî wê dewletê derxînin ku tenê Ermenitsan li pişta wê ye.

Li gor serjimêriya herî dawî ya Ermenitsanê ku sala 2011’an hatiye encamdan, li wî welatî de bi giştî nêzîkî 38 hezar Kurd dijîn ku ji 35 hezar kes ji wan re Êzidî tê gotin û ew 3 hezar kesên din jî wek Kurd hatine binavkirin.

Helbet tê gotin ku Ermenistan jî qet li mafên Kurdan mikur nehatiye. Lê belê di vê navberê de zêdetirbûna heşîmeta Ermeniyan li wê navçeyê, nîşan dide ku ew navçe, mafê Ermeniyan e. Ji xeynî hin gund û navçeyên biçûk ên Azeriyanê, lê belê navçeyên din hemû yan jî piranî Ermenî ne.

Li Azerbaycanê jî ji Kurdan re tê gotin Azerî. Li wir qet zimanê Kurdî bi fermî nehatiye naskirin.

Di vê navberê de hin welat jî hene ku dixwazin rewşê aram bikin. Amerîkayê ragehand, ku çekdarên Sûrî ji Lîbya re hatine veguhestin û ew bûye sedema alozî, şer û kuştinên zêdetir.

DYA herweisa Tirkiye hişyar kir û ragehand, şandina çekdarên Sûrî bo şerê navbera Ermenîstan û Azerbeycanê heman alozî û şer û kuştinên li Lîbyayê dê li wê navçeyê jî dubare bike.

Beriya niha jî Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragehandibû, heta niha hejmara çekdarên Sûrî li Azerbeycanê gehiştiye 850 çekdaran û çavnihêrî hene hejmarekî zêdetir a çekdaran ji aliyê Tirkiyê ve bên şandin.

Di şerê Azerbeycan û Ermenistanê de bi dehan çekdarên Şûrî yên ku Tirkiyê ew şandine şerê Ermenistanê, hatin kuştin.

Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirov ragihand, di 48 demjimêrên borî de, 36 çekdarên Sûrî yên ku Tirkiyê ew şandine eniya şer, hatine kuştin û bi dehan jî birîndar bûne.

Wê saziya sivîl da zanîn, bi giştî heta niha 64 çekdarên Sûrî li Qerebaxê hatine kuştin.

Tirkiye ku di şerê Qerebaxê de piştevaniya Azerbeycanê dike, hejmarek ji çekdarên opozîsyona Sûriyê tevlî wî şerî kirin. Li gor zaniyariyên Rewangehê, heta niha Tirkiyê 1200 çekdarên Sûrî şandine şerê Qerebaxê.

Hevdem serokwezîrê Ermenistanê Nikol Pashinyan bang li civata navnetewî kir, da ku pişt rast bibin ku Tirkiye destê xwe nexe nava nakokiyên di navbera wan û Azerbaycanê da li ser herêma Nagrono – Qarabaxê.

Ev hişdarî ya ji aliyê Serok hikûmetê Ermenistanê ve di wî çaxî de hat ku şer di navbera Ermenistanê û Azerbycanê de derketî û Tirkiyê piştevaniya xwe bo Azerbaycanê diyar kiribû.

Balyozê Ermenistanê li Moskovayê Fardan Taganyan jî daye zanîn ku Tirkiye 4 hezar komên çekdar ên Sûriyê bo şer li dijî Ermenistanê bikin bo bereyên şer ê Azerbaycan û Ermenistanê şandine.

Herwisa Fardan Taganyan tekez jî kiriye Tirkiye wan komên tûndrew ên Sûriyê perwerde kirine û dixwaze wan di şerê li dijî Ermenistanê de bikarbîne.

Îranê helwesteke cuda hebû û tenê dixwaze berjewendiyên wê parastî bin. Wate ji bo rêjîma Tehranê ne mafên Ermeniyan, lê belê berjewebdiya wan girîngtir e.

# Rojavayê kurdistanê di navbera êrîşên Tirikiyê û bêtifaqiya kurdî de



**N: Ebdulezîz Qasim**



Goman di wê yekê de nîne, ku dewleta Tirkiyê wekî dewleteke dagîrker û dijminê dîrokê yê Gelê Kurd, bi bername û bi plan li dijî bidestxistina mafên gelê kurd li her dever û warekî hebe dixebite, ev yek çendîn car li ser zarên rayedarên dewleta Tirkiyê hatiye gotin, bi taybetî ku îro hewl dide rêbigire li pêş dubarebûna ezmûna Herêma Kurdistanê li Rojavayê Kurdistanê, lewra her ji destpêka krîza Sûriyê ve, hewl dide bi her awayekî derbasî nav karûbarên Sûriyê bibe, bo dagîrkirina Rojavayê Kurdistanê û qirkirin û koçberkirina miletê kurd, bi behaneya PKKê yan jî bi her behaneyeke din, wekî gotina pêşiyan "Av disekine û Dijmin nasekine", û ji bo pêkanîna armancên xwe yên aşkere û herwisa yên veşartî li dijî hebûna gelê kurd, dê hewl bide bo bikaranîna her delîve û derfeteke navdewletî û herêmî û navxweyî, bo peydakirina behaneyan bo pêkanîna armancên xwe û bi taybetî bi behaneya PKK, ku ew jî bi mixabinî gelek caran wan behaneyan dide dest Tirkiyê!

Her kurdek dizanê ku Tirkiyê bitenê li sînorê Efrîn û Serêkaniyê ranaweste, dê kar ji bo dagîrkirina tevaya navçeyên Kurdî bike, ku her demê delîveyek bo peyda bibe heta bê bihane jî be, wê dest bi êrîş û dagîrkeriya xwe bike, ku her ji sala 2016'an û heta niha gelek navçeyên kurdî dagîr kiriye (Cerablis, Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê) herwisa dê berdewam be, tevî ku berpirsên PYD bi aşkere radigehînin ku xebata wan ji bo "Neteweya Demokrata" û ne ji bo pêkanîna statoyek kurdî ye!

Lê herwisa jî PYD ji aliyê Tirkiyê û opozîsyona Sûrî û heta ji aliyê rêjîmê ve jî bi cudaxwaziyê tê gunehbar kirin, ku firoke û droneyên Tirkiyê bê rehm û cudahî xak û miletê Rojavayê Kurdistanê dişewtîne, û jêrxana aborî û dezgehên sivîl jî wêran dike, bê cudahî tevaya miletê kurd armanc dike, lê em baş dizanin ku ev êrîş têne pêkanîn di şert û mercên dijwar de, ku Tirkiyê baş rewşa navdewletî dixwîne û baş bikar tîne û agih ji rewşa navdewletî û herêmî û herwiha agih ji rewşa parçebûn û bêtifaqiya gelê kurd heye!

Helbet Amerîka û Ewropa li gorî berjewendiyên xwe dixebtin, û HSD di van çend salên borî de gelek destkevt li dijî rêkxistina DAIŞê ya terorîst bidest xistiye, lê di heman demê de divê ezmûna Efrînê û Serêkaniyê û Girêspî li pêş çavan bigirin û çavê xwe ji rastiyê negirin, lê dikarin bêjin ku niha ne bitenê Amerîka û Ewropa li hember êrîşên Tirkiyê bêdeng in, mixabin ku heta aliyên kurdî jî bêdeng in, nemaze aliyên xwe bi (projeyê neteweyî" binav dikin, û di ragihandina xwe dewleta Tirkiyê wekî dagîrker nabînin, bi wî awayî bi pişrastî îro dikarin bêjin ku hîç aliyek yan rexekî siyasî nûneratiya miletê kurd û doza neteweyî nake.

Em kuh bûne, û careke din behsa girîngiya tifaq û yekrêziya partiyên kurdî nakin, ku di van şert û mercên niha de nabin yek, nemaze ku hejmara wan gihiştiye nêzîk sedê "tê gotin ku îro nêzîk 100 partiyên kurdî li Rojavayê Kurdistanê hene", ku mixabin li şûna xebata neteweyî bikin, bûne bargiraniyeke mezin li ser doza miletê kurd, ku bazirganiyê bi doza pîroz ya kurdî dikin û nanê xwe pê dixwin, lewra gerew li ser wan nabe û ti hêvî li ser wan nayên girêdan û pêdivî bû ku ji demek dirêj hatiban avêtin di zibildana dîrokê de.

Di dîroka dûr û dirêj de, hêvî ji miletê kurdî qut nebûye, û heta hetayê gelê kurd bêdeng namîne, û li gorî xwendina min ku miletê me çi li welat û çi li derveyî welêt di demekê nîzîk de, wê bersiveke dirust hebe, hem li hember dijminan û hem li hember rewşa navxweyî ya kurdî jî, ku ew bersiv dê bibe zimanhalê rasteqîn yê xwest û daxwazên Gelê Kurd.

**Naveroka vê nivîsê, nerîn û dîtina nivîskar bi xwe ye û rojnameya Agitî jê berpirsiyar nine**



# Berdewamiya êrîşên Îsraîlê bo ser binkeyên Hemasê li bajarê Xezê

Arteşa Îsraîlê ragehandiye ku şeva Yekşemî li ser Duşemî rêkefta 16e li ser 17ê Rezberê, zêdetir ji 500 cihên peywendîdar bi Hemasê li bajarê Xezê hatine bombebaran kirin.

Li gorî ragehandina Arteşa Îsraîlê, hêzên taybet çûne nav operasyona kontirolkirina çar cihên ku heya niha hêzên Hemasê têde amade ne.

Roja Yekşemî 16ê Rezberê, welatê Îsraîlê bi fermî rewşa şer ragehand û çiraya Kesik bo Kiryarên Serbazî yên berfireh, bo Arteşa wî welatî hil kir.

Dawî amarên Arteşa Îsraîlê, hejmara kuştiyên Îsraîlê ji 700 kesan derbabû, herwisa 2 hezar û 150 Îsraîlî jî birîndar bûne.

Di hember de, li encama êrîşên esmanî yên Îsraîlê bo ser Xezê zêdetir ji 400 kesan hatine kuştin.

Hevdem Neteweyên Yekgirtî behsa vê yekê dike ku hejmara rûniştiyên Xezê li encama şerê di navbera Îsraîl û Hemasê de ku aware bûne, giha bi 123 hezar kesan.

Li gorî amara Nivîsîngeha Hevahengî ya karûbarên Mirovî ya Neteweyên Yekgirtî, li du rojên yekem li şerê di navbera Îsraîl û Hemasê de, aliyê kêm 109 avahî û saxtiman li deverên cuda cuda li bajarê Xezê wêran bûne ku hezar û 210 avahyên din jî xisar ber keftine.



## Rêveberiya Xweser: 29 edamên asayîşê canê xwe ji dest da

Rêveberiya Xweser ragihand ku di encama êrişa Tirkiyeyê de 29 edamên asayîşê canê xwe ji dest daye.

Artêşa Tirkiyeyê şeva borî akademiyeke hêzên asayişa Rêveberiya Xweser bombebaran kiribû.

Rêveberiya Xweser da zanîn ku di vê êrişê de 29 edamên asayîşê canê xwe ji dest daye, 28 endamên asayîşê jî birîndar bûne.
Ç: RÛDAW



## salvegera şehîdên şoreşa Jînayê li 16ê Rezberê yên bajarê Sinê bi bilind hate ragirtin




li 16ê Rezbera 1401 Rojî, şehêd “Pêyman Minberî, Daryûş Elîzade, Yehya Rehîmî û Mihemed Emînî” li bajarê Sinê de ji aliyê hêzên hov ên rejîma Îranê ve hatine şehîdkirin û salvegera wan şehîdan li wî bajarî de bi bilind hate ragirtin.

Malbata şehîd “Peyman Minberî” li salvegera şehîdbûna wî de cihê şehîdbûna wî gulbaran kirin û gulên sor li cihê şehîdbûna wî de danîn.

Herwisa tirba şehîd “Daryûş Elîzade” ji aliyê dayka wî ve bi gulên sor hate xemilandin û yad wî şehîdî bi bilind hate ragirtin.

Herwisa cihê şehîdbûna “Mihemed Emînî” jî ji aliyê malbata wî ve bi gulên sor hate xemilandin.

Ew şehîdên şoreşa Jînayê aliyê hêzên ewlehî û leşkerî yên rejîma Îranê ve bi gulleyên şer hatine şehîd kirin.

# Kurteyek ji serpêhatiya Qanatê Kurdo

Gelek kurdên êzidî ku ji ber zilm û zordariya Osmaniyan reviyabûne Yekîtiya Soviyeta û di welatên Ermenistan û Gurcistanê de nîştecih bibûn ji îmkanatên heyî di wan dewletan de ji bo pêşvebirina ziman û çanda netewî sûdek baş wergirtin.

Di nav wan de gelek zana û nivîskarên bi navûdeng hilkeftin ku yek ji wan kurdnasê bi navûdeng Qanatê Kurdo bû. Ew yek ji wan kesan bû ku bingeha Kurdnasiyê li Yekîtiya Soviyetê dana.

Qanatê Kurdo li 12ê Îlona sala 1909an li gundê Sûsiz ê ser bi navçeya Dîgora girêdayî navçeya Qersê, ji malbeteke cotkar ji dayîk bûye. Di dema şerê cihanî yê yekem de, malbeta Qanatê Kurdo jî mîna hezaran malbetên kurdên êzidî yên Bakurê Kurdistanê, mal û milkên xwe û welatê xwe bicih hêştin û ji ber zilm û dagîrker ber bi Ermenistanê ve çûn.

Piştî şoreşa Oktobrê ertêşa Rûsiyê ji Qefqaziyayê vedikêşe û ertêşa Tirkan beşeke Ermenistanê dagîr dike û bi hezaran kurdên êzidî ji aliyê ertêşa Tirkan ve têne qirkirin. Di nav wê qirkirinê de malabta Qanatê Kurdî jî hebû û ji malbeta Qanat tenê çend kes sax dimînin û ji qirkirnê rizgar dibin. Ew bi neçarî ve koçberê welatê Gurcistanê dibin û li bajarê Tiflîsê nîştecih dibin.

Qanatê Kurdo xwendina xwe ya destpêkî li dibistanên wê deverê diqedîne. Sala 1928an bi hewla Erebê Şemo, Komîteya Navendî ya Partiya Komonîst a Ermenistanê 8 ciwanên kurd ji bo xwendinê dişîne Lênîngrada Rûsiyê, yek ji wan kesan jî Qanatê Kurdo bû.

Navbirî derbarê zimanê kurdî de zêde xwe mandî dike û bi başî li pey rêzman û rênivîsa kurdî dikeve. Di wê demê de ew jêriya xwe nîşan dide û tevî berdewamkirina xwendina xwe li zanîngehê, li fakulta kedkaran dibe mamostayê zimanê Kurdî.

Qanatê Kurdo piştî bi dawîanîna xwendina bilind, bi îzna serokatiya zanîngehê li zanîngehê dimîne û li ser zimanê kurdî lêkolînê dike.

Li sala 1941an dema ku Almaniyayê êrîşî ser Yekîtiya Soviyetê kir, Qanatê Kurdo xwebexş di eniya şer de wek fermandê desteya topxanan beşdariyê dike û heta dema dawîhatina şer dimîne û bi gelek medalan tê xelatkirin. Piştî şer li zanîngeha Lênîngradê dibe mamostayê zimanê kurdî. Wî gelek dersxwan û xwendevanên mîna Margarîta Rûdênko, Rûslan Sabolov, Zera Elî Yûsipova hînê zimanê Kurdî kir ku piştre ew dibine kurdnasên navdar.



Qanatê Kurdo di heman salan de jî li enstîtûya zanyariyê ya mirovnasiyê kar dike û piştre jî dibe hevkarê enstîtûya Rojhilatnasiyê.

Pênûsa Qanatê Kurdo pir dewlemend bû, wî nêzî 85 pirtûk û gotarên zanîyarî çap kirine. Piraniya berhemên wî li ser Kurdzaniyê bûne. Çendîn gotarên Qanatê Kurdo li ser pirsa zimanê kurdî li rojnameya "Rêya Teze" jî hatine weşandin.

Li sala 1936an pirtûka Qanatê Kurdo ya "Gramatîka Zimanê Kurdî ya Kurt" li Êrêvanê bi zimanê kurdî hate çapkirin. Zarokên kurdan yên li Ermenistan û welatên din yên Yekîtiya Soviyetê bi pirtûkên Qanat yên hatinî amadekirin fêrê rêzimana zimanê Kurdî dibûn. Pirtûka Qanat ya "Gramara Zimanê Kurdî" ji bo dibistana destpêkî û pola 3 heta 8an heta sala 1985an dihate çapkirin.

Kurdzan û Zimanzan Sûkêrman, derbarê vê pirtûka Qenatê Kurdo nivîsiye: "Serkeftina vê pirtûkê ev e ku bi şêweyekî zanîstî hatiye nivîsandin. Qanatê Kurdo ne tenê lêkolîn li ser zimanê kurdî kiriye, belkî wî rêya lêkolîn û fêrbûnê destnîşan kiriye". Helbestvanê navdar "Ebdulah Peşêw", derbarê Qanatê Kurdo nivîsiye: "Mamoste Qanatê Kurdo, yek ji mêrên herî mezin ê kurd bû, çi wek kesayetî, çi wek zana, çi wek nîştimanperwarekî Kurdisantanî".



Qanatê Kurdo di xizmetkirin bi netewa xwe û kurdzaniyê de xizmetek bêwestan kir. Wî di hemû jiyana xwe de ji bo parastina berjewendiyên gelê kurd, ziman, dîrok û çanda gelê kurd xebat dikir.

Berhemên Qanatê Kurdo jî ev in:
Zimanê Kurdî (Rêzimana Kurmancî) sala 1957an hatiye çapkirin.
Ferhenga kurdî Kurmancî bi Rûsî 1960an hatiye çapkirin.
Ferhenga Kurdî Soranî bi Rûsî sala 1983an hatiye çapkirin.
Kurmanciya jor û Kurmanciya jêr sala 1973an hatiye çapkirin.
Tarîxa Edebiyata Kurdî cilda yekem 1983an û cild duyem jî sala 1985an hatiye çapkirin.
Gramêra Zimanê Kurdî li sala 1990an hatiye çapkirin.
Qanatê Kurdo li 31ê Cotmeha sala 1985an çû ser dilovaniya Xwedê û wî ji bo gelê xwe mîrateke mezin bicih hêşt.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## 7 sal û 6 meh cezayê girtîgehê li Sakîne Perwane hate birîn

Li gorî rapora ajansa Nûçegihaniy a Hiranayê, Sakîne Perwane girtiya siyasî li girtîgeha Vekîl Abad a bajarê Meşhedê, ji aliyê liqê yekem ê dadgeha Şoreş a bajarê Meşhedê bi 7 sal û 6 meh heps hat cezakirin.

Li gor hikmê ku vê dawiyê ji aliyê taya yekem ê dadgeha Şoreş a bajarê Meşhedê bi serokatiya dadwer "Hadî Mensûrî" û xizmetkirina wê girtiya siyasî ya Kurd, bi tohmeta "komkirin û lihevkirina li dijî ewlekariya welat, propaganda li dijî Komara Îslamî ya Îranê û heqareta li "Rêber" bi giştî heft sal û 6 meh heps hatiye cezakirin.

Hirana ji zarê çavkaniyeke haydar ragihand: "Tevî ku parêzer Xosrow Elîkurdî berpirsê dosyeya xanima Perwane ye, lê serokê taya yekem ê dadgeha Şoreş a Meşhedê roja rûniştina dozê li ser tohmetên xanima Perwane di hevdîtinê de hebûna vî parêzerî amadebûna di dadgehê de asteng kir.

Sakîne Perwane di meha Nîsana îsal de piştî amadebûna li ser gora Elî Mozeferî yek ji şehîdên serhildana şoreşgerî ya Jin, Jiyan û Azadî li bajarê Qoçanê hatibû binçavkirin û bo girtîgeha îtlaata Spaha Pasdaran a vî bajarî hatibû veguhastin. Herî dawî piştî duwazdeh rojan ji girtina di vê saziya ewlehiyê de bo girtîgeha Vekîl Abad a Meşhedê hat veguhastin.

Berê jî ji ber çalakiyên xwe hatibû girtin û mehkûm bûbû. Xanima Perwane di nîva duyem a sala 2018'an de ji aliyê hêzên îtlaata Pasdaran ve hatibû binçavkirin û di dawiyê de ji aliyê dadgeha Şoreşa Tehranê ve bi 5 sal heps û weke cezayê zêde 2 sal qedexekirina endamtiya rêxistinên siyasî hate mehkûmkirin. Di dawîya Rêbendana sala 1401 an de, piştî derçûna dorhêla "Efûyê" hat berdan.

## Riza Nezerî Kakvendî çalakiyên wî yên şanoyê, hatin qedexekirin

Lîstikvan, xebatkar û çêkerê şanoyê Riza (Havyer) Nezerî Kakvendî bi biryara Dayreya Hunerên Şanoyê ya Wezareta Çand û Îrşada Îslamî ji hunera şanoyê çalakiyên wî hatin qedexekirin û heta demeke din destûr nayê dayîn ku hunera şanoyê bike.

Li gor çavkaniyeke agehdar, ev lîstikvanê temen 25 salî, roja Pêncşemî 13ê Rezberê, ji aliyê dezgeha hunerên şanoyê ya Wezareta Rewşenbîrî û Îrşada Îslamî ve bi vê biryarê hatiye agahdarkirin.

Roja 30ê Xermanana sala 1402an de, ev hunermend bi sedema çalakiyên xwe yên li qada bilind û piştevanîkirina ji daxwazên xelkê, ji aliyê hêzên ewlehiyê yên Şehryar Kerecê ve hat binçavkirin û ji bo wergirtina îtirafên bi zorê, li girtîgeha ewlehiyê de bi tundî hat îşkencekirin.

Nezerî Kakvendî piştî bidawîhatina lêpirsînê û eşkerekirina tohmetan, roja 8`ê Rezberê ji girtîgeha Tehranê hat azadkirin.
Riza Nezerî Kakvendî xelkê Hersînê yê girêdayî parêzgeha Kirmaşanê ye û rûniştiyê Şehryar a Kerecê ye.

## Seqiz; Binçavkirina Keyvan Rehîmî ji aliyê hêzên ewlehiyê ve

Roja Pêncşemî 13'ê Rezberê, Keyvan Rehîmî endamê Parsman Seqizê û çalakvanê medyayî yê Kurd ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hat binçavkirin.

Li gor çavkaniyek agehdar, hêzên ewlehiyê avêtine ser mala vî endamî Parsman Seqizê û ew binçav kirine.

Vê çavkaniya haydar her wiha got: Piştî binçavkirinê, ev welatiyê han bo navenda îtila`ata Seqizê hate veguhastin.

Vê çavkaniya haydar diyar kir: Rehîmî piştî piştevanîkirina ji Hêro Qedîmî, Şêrko Hicazî, Azad Emînî û Semîra Ehmedî çar çalakvanên medenî yên girtî yên bajarê Seqizê hatiye binçavkirin.

Keyvan Rehîmî di Rezbera sala 1400'an de bi tohmeta "Propagandaya li dijî sîstema Komara Îslamî ya Îranê" ji aliyê dadgeha Şoreş a bajarê Seqizê ve bi 8 meh heps hat cezakirin.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê, ti zanyariyên berfireh li derheq sedema binçavkirin û tohmetbarkirina Keyvan Rehîmî de tune ye.

### Welatiyekî Kurd temen 37salî û xelkê Murmurî ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîmê ve hate girtin

Êvareya roja Duşemî 10'ê Rezberê, welatiyekî Kurd yê bi navê Ehmed Tekilîfî temen 37 salî û xelkê Murmurî yê ser bi parêzgeha Îlamê girêdaya bajarê Avdananê ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîmê ve hate girtin û bo cihekî nexuya hate veguhastin.

Li gorî çavkaniyeke agehdar, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ev welatiyê Kurd girtine.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê ti zanyariyek li derheq sedema girtin û tohmetên ku bi ser navbirî de hatî sepandin ber dest nîne.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdiśtanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (455)

